

Zagona tevlîbûna civakî ya nû: “teşwîq û zelal kirin”

Ev zagone ji 1 ê Desembera 2016 an hatîye pêk anîn û di nav de guhertinên berçav hene ku divê wan berçav bigirin. Ev zagone pêk tê ji maf û berpîrsî, **kiryarrên piştgiriyê ji bo we û pêdiviyên we.**

Perwerdeya dê baştir bê piştgirî kirin:

- Demên pêdivî ku divê ji bo perwerdeyê li bendê bin tê kurttir bibe,
 - Paşê di dema perwerdeyê, dê hinek alîkarî radest we bibin,
 - Hinek tedbîr ji bo amade kirina we ji bo pîşeya we hatine berçav girtin,
 - 100,000 şûn ji bo asan kirina pêşdebirina tevlîbûna civakî ya we tên afirandin.
 - Eger we derfeta perwerdeyê wek neteweyek biyanî yê pejirandî, bikar anîn be, tûşî sûcên krîmînal nebibin, û nasnameya we hatibe piştrast kirin:
 - Beşdar bûna we li tevaya dema perwerdehiya pîşeyî ya we da dê qebûl kirin, bi gotinek dî ne pêdivîye ku hûn ji dersînorkirinê bitirsin.
 - Piştî bi dawî anîna perwerdeyê, qebûl kirin heta şeş mehên din jî ji bo we berdewam dibe daku pey şolek kêrhatî li gel perwerdeya pîşeyî ya xwe, bigerên.
 - Iza rûniştinê dikare ji bo du salan piştî encama serkeftî ya perwerdeyê şolê di karê ku we têde perwerde dîtîye, derbiçe. Hinek sînor ji bo penaberên ji welatên sereke ku ewle ne, li gor roja hatinê û pêşkêş kirina daxwaza penaberiyê dên sebandin.
- Di her rewşê de, divê hûn xizmeta şewirmendiyê radest kirî ji aliyê invsîngeha kesên biyanî bikar bînin da ku bersîvek zelal ji bo hemû pîrsên xwe bistînin.
- Di sê salên pêşîyê de, hûnê bi hêsanî bikarin tevlî bazara şolê bibin; di vê demê de ev babete nayê lêkolîn kirin ka kesek Elmanî jî dixwaza vê şolê kirîye an na (ku di xênjî vê, xwedî maf dihate zanîn.)

Li aliyê din hûn berpîrsin ku beşdarîya xizmetên tevlîbûna civakî yê radet bûyî, bikin:

Eger kêmasîya we hebe, gengaze ku mecbûr bin ku xercê vê bidin:

- Eger kurs bi awayekî kêrhatî bêne pêşkêş kirin, divê hûn di nav salekê de, beşdarî ya wan bikin,
- Piştî dawîhatina kursê (600 demjimêr kursên ziman, 100 demjimêr kursên ahengdarî), hûn dê tenê bi mercekê bawernameyê bistînin, ku bi serûberî beşdar bibin (beşdarnebûna izindar tenê bi pêşkêş kirina belgeyê tê pejirandin). Hûn nikarin bawernameyê bistînin, eger we bo beşdar nebûna xwe ti belge tune be.
- Eger we pêwîstiyên destnîşankirî di navendê de cîbecî nekiribin (Ev babetene ji bo cîbecîkirina karekî giring in):
 - Ji bio nimûne. Pêdivîya bi piştrast kirina herî kêrşarezayîya zimanî du asta B1 an
 - Beşdarbûna bi rêkûpêk di demên ku ji were tene terxan kirin

Eger we nekarî ev mercane pêk bînin, tê diravê ku ji were bê pêşkêş kirin, kêr bibe: **tê diravek kêmtir ji we re bê pêşkêş kirin.**

Hûn berpirsiyarin ku gel xizmetên tevlîbûna civakî yê radest kirî, hevkarîyê bikin...

Tevî ku hûn zimanê Elmanî bizanin jî, divê beşdarî kursên tevlîbûna civakî yê BAMF bibin, helbet ji bo demeke kurttir, piştî azmûnê,

- Divê hûn di nava sê salan de li cihê ku di Nordrhein-Westfalen de ji bo we hatiye destnîşan kirin, bimîne. Ev babete bi mercekê piştguh tê xistin, ku hûn li cihek din kar peyda bikin; li bûyereke wisa de, divê mercên jêr pêk bên:
 - Divê hûn herî kêr 15 demjimêran li hefteyê kar bikin
 - Divê hûn herî kêr 712 € di mehê de qezenc, bikin
 - Divê hûn **pêş (!)** veguhestinê daxwaza xwe radestî Nivîngêha Kesê Bîyanî bikin.
- Nivîngêha Kesê Bîyanî dikare we ji pêdiviya rûniştgeha sabit, mîaf bike, eger ku hûn daxwaz bikin, bi wî mercî ku hûn li cihek dûr tevî bernameya perwerdeyê an bernameya xwendinê bibin.
- Eger we mafê penaberîyê hebe, li gor zagonên nû mafê rûniştina li Elmanya yê bê sinor piştî **pênc** salan radestî we dibe (berê piştî sê salan bû):
 - Hûnê tenê bi mercekê ev mafê rûniştinê bidest binin ku bikarin piştrast bikin ku hûn bi qasî kêrhatî ziman dizanin. (azmûna A2) û
 - Eger herî kêr 50% xercên jîyana xwe, bi xwe bikarin qezenc bikin.
- Piştî **sê salan** hûn dê destûra rûniştinê bistînin bi wî mercî ku we azmûn C1 derbas kiribe û bêtir ji % 50 ji xercên malbata xwe, bi xwe bikarin qezenc bikin.

Ev zagonane piştrast dikin ku:

- Tevlîbûna nav bazara kar û
- Fêrbûna zimanê Elmanî

Pêwîstîyên pêdivî ji bo rûniştina li Elmanya yê.

Berpirsîyarê naverokê: Peter Stadie, Holger Frings, Hevaheng kerê panaxwazan û penaberan, Bad Münstereifel. Ev şirove bi rewşek nedilxwaz hatiye kurt kirin; em ji we dixawzin ku têbigehîşin, ku em nikarin ti garantîyek di vê babetê da qebûl bikin. Eger pêdivîya we bi aghdariyên berfireh yê şexsî heye, Ajansa Penaberan ya DRK û Karitas, Nivîngêha Kesê Bîyanî, Xala tevlîbûna civakî, Daîreya Refaha Civakî û Alîkarên Penaberan di civata we de berdest bin. Herwisa ji navnîşana jêr binêrin:

<https://www.bundesregierung.de/Content/DE/Artikel/2016/05/2016-05-25-integrationsgesetz-beschlossen.html>, <http://www.asylhelfer-puchheim.de/images/hintergrundpapier-zum-integrationsgesetz.pdf>.

Gefördert durch:

12/2016



Ministerium für Arbeit,
Integration und Soziales
des Landes Nordrhein-Westfalen

